

Serdaneke Dîrokî

Serdana Mezargeha Şêx Misafir ê Hekar îli Libnanê

Xidir Domilî/ Beyrût

Wergerandina Kurdî: Dilgeş Îsa

Di qunaxa rêya me de ji Beyrûtê bo Kendalê Bîqaaê rojavayî ku bihtrî seat û nîvekê dewam kir, gelek tiştên ku derbarey kesayeta Şêx Adî kurê Misafirê Hekarî hatîn nivîsandin, dihatin bîra min; nemaza ew bîr û baweriyêن cur be cur ku li ser eslê wî yê kurdî û ji dayikbûna wî li Libnanê hatin nivîsandin. Herbihneke şifîrê terembêlê, Corc Bedran ez bi pirsên xwe hişiyar dikirim. Digot, erê gelo rast e, ku heta neha ti kes ji Êzdiyan nehatiya serdana vê mezargehê?

Serê sibê zû, seat nêzîkî heftan, em nêzîkî gundê „Xerba Qenafar“ bûn, em li ber deriyê malekê rawestan û me li rêya Mezargehê pirsî, ciwamêrek li me derket ûgota me, wa hun nêzîkî Mezargehê bûna, gelek nemaya hunê bigehnê.

Di destpêka gundi de Mezargeh û Dibistana Mar Yohana ya babêt Meriyemî li ser textekî reş dest nîşankirî ne.

Mezargeh ji nîvî gund ve diyar dibe, Mezargeh dikevê rojavayî gund û li ser serê girekî hatiya avakirin, gir jî nêzîkî deh mitiran bilind e. Li rojavayî Mezargehê dibistaneke ne geleke kevin heye û di rex dibistanê jî de karxaneke bicûk heye, jî aliyê rojhilat ve bexcekî sêvan î mezin heye. Di rex Mezargehê de li ser wî girî zeviyeke bêxwedî jî heye, ferehiya wî 20 mitir di 30 mitir de ye, di demê berê de ew erd di nav tixûbê Mezargehê de bû.

Mezargeh bi xwe jî ne gelekî mezin e û ne wekî Mezargehên Êzdixanê ye, odeke bicûk e, ferehiya wê çar mitir in, dirêjiya wê pênc mitir in û bilindiya wê jî nêzîkî sê mitira ye, li ser serê odê jî qubek jî bi bilindiya du mitiran heye. Hewşa Mezargehê ne gelekî mezin e, 15 mitiran fereh e û 20 mitiran dirêj e. Diyar e ku Mezargeh ji mêj ve bê guhdan maya, ji ber dîwarên hewşê dikin bikevin û giya û gulên tê de dirêj bûna; dîwarên Mezargehê ji keviran û çemento hatina avakirin, di hundrê wê de şopê çîra xwiya dikirn.

Dema cara pêşî em çûna Mezargehê, dergehê wê kilît kirîbû û di destpêkê de ti kesî nizanîbû kilît li cem kê ye.

Hevdîtna me ya pêşî li gel birêz Merwan alxetîb (58 salî) bû, ji bo me li ser Mezargehê û Xwedane wê axivî û got:

Em li vê deverê hemî dizanin ku ev Mezar ya Şêx Misafir e, û tê gotin ku ew Kur d e û edewî ye, û wek tê gotin ev Mezargeh ji beriya hezar salî ve bi gundê Qinafarê ve girêdaya. Piştra birêz Merwan bo me li ser hestê merovêن wê deverê ji boy Mezargehê axivî û got:

Ji dema ku tê bîra me, bav û kalê me têne serdana vê Mezargehê û qurbanîya ji bo wê tînin, û tê bîra min, dema ez xort bûm, min dît ku xelkêt gundêt derdora Mezargehê salê dû caran dihatin serdana wê, li dora wê rojekê sax dîlan û govend digirtin û qûrbanî pêşkêşî Xwedanê wê dikirin. Lî pişti şerê navxweyî ev rê û rism winda bûn. Wekî din jî axiftina xwe berdewam kir û got:

Mezargeh ji neha mezinitir bû, lê piştî erdê wê ket destê şehirdariyê, şehirdariyê ew erd firot. Birêz Merwan bûyereke giring ïna bîra xwe û got ku xelkêt gundekî ji vê herêma me, dû caran hewil dan ku Mezargehê hilweisînin, lê em beramberî wan rawestan. Li ser sedemên vê kiriyarê got: digotin ku mirîdên Şêx Misafir (...) diparêzin. Birêz Merwan diyarkir ku wî gelekî xizmeta Mezargehê kiriya, ji beriya 50 salî ve dema ew hata gund, xaniyê wî di rex Mezargehê de bû û dibêje ku wan ti carî serê xwe bi wan axiftinênu ku li ser Şêx Misafir dihatin belavkirin nedîşand, ji ber ku Mezargeh ji boy wan heta neha cihekî pîroz e.

Di dawiya axiftina xwe de berê me de Muxtarê gundê „Kefriyê, birêz Isam Behaa Aldîn. Gota me ku kilîta Mezargehê li ba wî ye û diba ku ew yan serokê şehirdariyê yêt berê zanibin ka ew hersê gorêt di Mezargehê de yêt kî ne?

Gundê Kefriyê sê kîlomitiran dûrî gundê Qenafar bû, dema em çûna gund hêşta xelkêt gundî nivistî bûn. Gundê Kefriyê gundekî gelekî ciwan bû, nişteciyên gundî Dir ûz û Fele (Xir istiyan) bûn, lê me bihîst ku dema ber ê ev gund yêt Kur dan bû, lê neha kurd tê de ne mana.

Me berê xwe da mala Müxtarê gund, piştî dergeh ji me re vekir û me silav li hev kir, li ser mebesta serdana me pîrsî, min jê re got, ez ji Kurdistanâ İraqê me û ez dixwazim zanibim ka ci di nava Mizargehê de ye. Li min vegerand û got: ci karê te bi Mezargehê heye?

Min bersiv da û got, Şêx Misafir gelekî li cem me bi qedir û qîmet e û ez dixwazim zanibim ka Tu ci li ser wî dizanî?

Birêz Îsam di nav sala de çûbû, 65 sal derbas kiribûn, piştî ku dengê xwe zelal kir, bersiv da û got: tiştê ez ji zarokiya xwe ve dizanim ew e ku ji dema ku em li gund in, em di rojê cejnan de dicûna serdana wê û qedir û qîmeta wê li cem xelkêt herêmê hemiyan hebû, û tê gotin ku ev Mezar geh nêzîkî nehsed (900) sal kevin e, û herwiha tê gotin ku navê wî Şêxî ji ber wê hindê kir ina Misafir, ji ber ku gelekîr êwîtiya Şamê (Bîlad Alşam) û Îr aqê dikir, gelekî digeriya.

Wî jî berê me da birêz „Mihemed Xalid Salih“ serokê Şehirdariyê yê berê û got ku dibe aghedariyên wî bihtir bin, ji ber wî beriya sî (30) salî ev Mezargeh avakir.

Birêz Mihemed Xalid Salih (93 salî) nêzîkî sî (30) salî serokatiya bajêr kiribû, mala wî jî ne gelekî ji male Muxtarî dûr bû, piştî em derbasî hundire mala wî bûn û piştî bi xêr hatinê, me pîrsa Mezargehê jê kir. Wî jî dixwest sedema pîrsiyariyê zanibit, min jê re got ku ez ji Kurdistanâ İraqê me û Şêx Misafir li cem me gelekî bi qedir e û ez dixwazim raporteka rojnamavanî li ser Mezargehê çêkim.

Bersiv da û got: beriya neha gelek Rojnamavan hatin vê deverê û li ser Mezargehê nîvisandina, tiştê ez li ser dizanim ew e ku, ev Mezar geh ya Şêx Misafir e û dihata gotin ku ew bavê „Adî“ bû, digotin, ew ji Welate Hekar ê ye. Û sebaret wan gorêt di hundire Mezargehê de got, ku ji wan re hatiya gotin ku gorek ya Şêx Misafir e û yek ya kurê wî ye û ya din jî ya Ceriya wan e. Tiştê me bihîst ku navê wê Şerîfa bû û ew jî di Mezargehê de hata binax kirin, ji ber wê gelekî xizmeta wî kir.

Min pîrsî, gelo ziriyet yan Mirîdêt wî hene?

Tiştê em dizanîn, ti paşmayê wî li vê deverê nîn in, lê gelek milikê wî hebû, nêzîkî şêst (60) donim erdê wî hebû, hemî dihata çandin, û gelek bax û bistanênu wî jî hebûn, lê wek ku tu dibînî piraniya wî erdî çû, bi tenê nêzîkî dused (200 m) mitirê çarkuckî mana, û ew jî encama berxwedana min bû. Dema ku ez serokê şehirdariya bajêr bûm, min dixwest ku ez Mezargehê ava bikim, û di dimahîkê de me di rîya şehirdariyê de karî quba wê ava bikin; quba wê di demê berê de ji neha bilindir bû û girover bû, eger me Mezargeh ava nekirba dê bi ser hev de hilweisiyaba.

Belê tu dikarî ji kerema xwe re ji me re bêjî, çima we xwest Mezargehê avabikin, sedem ci bû?

Mezargeh bi gundî ve girêdayî bû û Dirûzan û Filehan (Xiristiyan) qedirê wê digirt û dihatin serdana wê û qurbanî pêşkêşî wê dikirin, û gelek caran dema qurbanî dihatin kuştin xelkêt gundî zadê xwe di hewşa Mezargehê de dixwarin. Rast e, ku erdê Mezargehê ji aliyê şehirdariya bajêr ve hata talankirin, lê ew milkê mayî, heke me guhê xwe nedayayê, dê hatiba wêrankirin, û sedema vê yekê ew bû, ku xelkêt gundêt nêzîk jî dihatin serdana wê. Û tişte herî balkêş ew e, ku Xwedanêt pezî pez û helalê xwe di dema biharî de diînan Mezargehê û li dora wê digerandin, ji ber behweriyan wan bi pîrozî, û quđretî û kerameta Xwedanê Mezargehê dihat û behwer dikirin ku bi vî rengî bereket dikeve nav pez û helalê wan û hijamra wan zêde dibe; û tê gotin ku her pezeke ku serê xwe dikire nava Mezargehê de, dikirina qûrbanî ta Xwedanê mezargehê li wan bête rehemê û Pezê wan ji nexweşîna û bela biparêzê û hijmarê wî zêde bike.

Û hêviyê wan bi cî dihatin, anku xêr û berekt dikete nav pezê wan?

Belê, xelkê behweriya xwe pê diyina.

Baş e, çima ti nivîsandin li ser Mezar gehê nîna?

Mixabin dema avakirina Mezargehê, ew berê ku navê Mezargehê û Xwedanê wê li ser hatibû nivîsandin, ji destê Hosta keft û şikest û me nema karî yekî din çêkin, ew ber ji kilsa erebî hatibû durust kirin.

Tu dikarî ji bo me li ser Mezargehê biaxivî, gelo ci li bîra te maya?

Hevjîna wî bersiv da û got: Em her ser sal di rojên cejnan de diçûna serdana Mezargehê. Tê bîra min çawa careke keça malbatekê bi kerameta Şêx Misafir saxlem bû. Keça wan lal bû û ne dikarî bi rê ve herê. Roja din em çûna mala wan û em hemî bi hev re çûna serdana gora Şêx Misafir û me çira li pêşıya quba wî hilkirin. Paşê ji me re gotin ku çawa keça wan ji nişkê ve saxlem bû, gotin ku keça wan rabû ser xwe û bi rê ve çû û diaxivî.

Gotina me ku rojekê keça wan ji xew rabû ûgota wan, ku Şêx Misafir şevî din hatibû xewna wê ûgota wê raba ser xwe û biaxive û here mizgîniyê bide bavê xwe. Keçikê got ku dema Şêx Misafir hata xewna min û li gel min axivî, min di destpêkê de behwer nikir, lê careka din hat û dîsagota min, rab û ez çûm û min xewna xwe ji bavê xwe re got, lê bavê min ji min behwer nekir; ez dîsa vegeriyam nav nivîna xwe û roja din sibî zû, ez rabûm û min taştê ji bo malbata xwe çêkir û ez li gel wan axivîm; dema malbata min ez dîtim, bahwer nekirin ku ez saxlem bûma. Paşê min ji bavê xwe daxwaz kir ku nedrekî/qurbaniyekî ji bo Şêx Misafir pêşkêş bike.

Hejîna Mihemed Xalid bedewamkir û got ku gelek çîrokêt wekî vê hene, heta van salêndawî jî dema merovek bi nexweşîna kêmaheyvê yan nexweşîneke din diket, ew diînan ber Mezargeha Şêx Misafir ta ku saxlem bibe; xelkêt li ber Mezargehê çira hildikirn û Qurbanî dikuştin û diwa ji boy Nexweşêt xwe dikirin, ta ku bi kerameta Şêx Misafir ji nexweşîya xwe baş bibin. Xanîma Mihemed Xalid li me mikur hat û got ku ew bi xwe jî gelek caran diçû ber Mezargehê.

Birêz Mihemed Xalid li ser Mezargehê dibêje ku jinek hebû, navê wê Cenîna Almisrî bû, ewê demeke dirêj xizmeta Mezarê kir û berpirsê Sindoqa Xêrata bû; û bi perên wê sindoqê Mezar hata avakirin. Di demêñ berê de bav û babîrêt xanîma Cenîna Almisrî guhê xwe didan zeviyêt Mezargehê û xizmetê wê dikirin; zevî nêzîkî şêst (60) donimî bûn û hemî darêt fêkî bûn. Neha tikes ji ziriyeta wê malbatê nemaya. Mihemed Xalid tîne bîra xwe ku xelkêt gundêñ nêzîk rojên eyd û erafatan diçûn serdana Mezargehê û Welîma li wê derê durust dikirin. Lî heta neha tikes tiştekî bi durustî li ser Şêx Misafir

nizanê, bi tenê dizanîn ku ew Şêxekî bi kerameta û qudretî ye. Wekî din jî me gelek çîrok ji devê xelkêt bihîstina ku bi kerameta Şêx Misafir saxlem bûna.

Min ji bir êz Mihemed Xalid pirsî, gelo ew dizanêt ku Êzdiyên cîhanê kur ê Şêx Misafir , Şêxadî diper êzin?

Bersiva min da û got: Me tiştekî wisa nebihîsta, lê dihata gotin ku gelek mir îdên wî li Îraqê hene û min ji bapîr ê xwe bihîst ku demê ber ê gelek Kur d dihatin ser dana wî, lê ji destpêka sedsala 20 ve ji ber sedemna nediyar nema hatin.

Mihemed Xalid ku sîh salî serokatiya bajêr kiriya, gelekî guhê xwe dida Mezargehê û dibêje ku hemî nişteciyên bajarê Kifriya û gundê Qenafar (Misilman, Fileh (Xiristiya) û Dirûz) rêsê ji Şêx Misafir re digirin.

Sebaret kilîta Mezargehê Mihemed Xalid dibêje ku berî demekê malbatekê kilît bir ta ku li Mezargehê zadekî bide û mixabin heta neha li me ne vegerandiya, ûgota min ku ji bilî gorêt hersê merovan tiştekî din tê de nîn e.

Min di serdana xwe de ji bilî dilpakî û başiya xelkêt wê deverê nedît, merov karê bêjê ku dilpakiya wan mîna dilpakiya Şêx Misafir bû, ew merovê qedirgiran ku bav û bapîrêt me çîrokêt wan ji bo me digotin. Bi destê min ve nehat ku ez wê tariyê bi temamî li ser Şêx Adî û eslê wî bidme alî, lê min di vê hewldana xwe de gelek tiştên veşartî aşkera kirin û hata xwiya kirin ku hemî Dîrokñasêt ku heta neha li ser Şêx Misafir nivîsandina, peywendî bi xelkêt gundê Qenefarê û herêmê re çênekirina û ti agehdariyên wan li ser Mezargeha Şêx Misafir nebûn. Di dimahîka hevdîtina me de, birêz Salih got ku heke tu îro piştî nîvro hatiba te dê gelek merovêt mîna min dîtibana ku dikarîn bo te gelek çîrok û çîvanokêt derbarey Şêx Misafir û keramet û qudretiya wî bêjin. Hemî Çîrok jî diyar dîkin ku Şêx Misafir şêxekî mezin bû û bi keramt bû, û dibe ku hindek ji wan çîrokan nezelalkirî bimînin ta ku ciyê wan parastî bimînin û pîroziya wan roj bi roj bihtir bibe.

Xidir Domilî

Wergerandina kurdî: Dilgesh Îsa